VÎNIYA

Berî heyamekê, ez di gel çend hevalên Duhokî pişikdarî kombûneke berfireh li Hewlêra paytext bûm. Ev kombûn e derbarey arêşeyên civakî û pirsên hevbend bi zanistê sosiyolojiyê ve bû. Komeke mamostayên zanîngehê û bisporên biyavê civaknasiyê di vê kombûnê de berhev bûbûn, zêdebarî hindek bispor û taybetmendên çavdêriya civakî ku ji dervey Kurdistanê beşdarî vê danûstandin û helsengandina rewşa heyî bûbûn.

Dr. Arif Hîto

Di hundirê kombûnê de, pêşkêşkirina haletên nalebarên civakî hebûn. Beşdarekî behsa neşaziya sêkesî û leşfiroşiyê kir, dema axivtin bi dawî hatî; du mamostayên zanîngehê dane xuyakirin ku ev e haletekî şaz e û ne rengvedana arêşeyên me yên civakê ye, çunko civakê Kurdî yê paqij û dûr e şaşî bi çi şêwazan van core haletan bi xwe ve nagire.

Mamostayeka dî got ku têza wê ya masterê li ser xêzana Kurdî bû, 400 arîşe wergirtine û yek jî behsa leşfiroşiyê nake. Bi rastî ev pêzanîn e cihê xweşî û serferazî û şehnazîpêkirnê ye ku li bajêrekê wek Hewlêrê yan li Kurdistanê yek haletê leşfiroşiyê nebe. Lê pirsa here giring ew e, ka ev pêzanîn e rast in yan jî wehmeke em xwe pê qayil dikin. Piraniya sosiyolojistên cîhanê dayne xuya kirin ku pirsên sincî û babetên leşfiroşiyê, di civakên girtî aborhejar de pêtir peyda dibin, nemaze civakên piştî şeran. Lê ev têhizrîna seyr û berevaja lêkolînên civaknasan çend xizmeta civakê kurdî dike!!

Bi hizra min, veşartina rastiyan û xewn dîtin bi civakê nimûneyî yê sincdar ve, civakî pêtir ber bi kevtinê û ladanê dibe. Fere, mirovê rewşenbîr agadarî civakê xwe be û wêrekane behsa diyardeyên wî bike, xwe eger jê nerazî be jî. Bi vê çendê çareserî dihêne dîtin û diyardeyên ne hejî di hêne rastvekirin.

Ew herdu mamostayên zanîngehê mîna du ne'aman hatine berçavên min, ku serûçavên wan di nav erdî de veşartîne û leşê wan bi tenê diyar e. Ji nû bo min xuya bû ka boçî civakê me li sedê bîst û yekê jî her paşvemayî ye. Baş e eger mamostayên zanîngehê hosa hizir bikin, pa dê çawa şagirdên wan fêrî bergumankirina diyardeyan bin û dê çawa azadan e hizir kin û danûstandinê li ser babetên çarenivêsî kin?!!!